Universität Bremen

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“

III.2.A. Ji Qadên Lêkolînê Mînakên Tevgerên Jinan ên li Tirkiyê

Aslı Polatdemir

Îlon 2017



blickwechsel
Studien zur zeitgenössischen Türkei
Ein Programm der Stiftung Mercator

III.2.A. Ji Qadên Lêkolînê Mînakên Tevgerên Jinan ên li Tirkiyê

Ev xebata ku li heremên Tirkiyê yên cuda, li şeş bajaran (Enqere, Diyarbekir, Muğla, Denizli, Trabzon, Navenda Artvin û Navçeya Hopayê) pêk hatiye, di çarçoveya lekolînên li qadan de dixwaze rewşa tevgerên jinan ên li Tirkîye binexşîne. Di vê beşê da pirnasnameyî û pirçandîbuna welêt û piralîbûna civakê tê berçav girtin û bandora wan a ser tevgerên jinan ên li Tirkiyê û nêzikatîyen wan ên sîyasî, yên ku di encama hevpevînên bi 65 pisporan derketine holê, tê sekinandin. Berî ku em derbasî mijara „tevgerên jinan ligel cudabûnên xwe di kîjan beşan û xalan de dikarin bi hev re bixebitin an jî koalîsyonan pek bînin“ bibin, em dixwazin di vê beşê de seknên wan ên cuda peşkeş bikin.[1]

Encamên vê beşê bi piranî ji nirxandinên bersivên pisporan ên ku di çarçoveya pirsa „hûn li Tirkîye kîjan tevgeran di nava tevgerên jinan de dihesibînin?“ de hatine kirin, pêk tê. Berî lêkolînên li qadan, di çarçoveya katagorîzekirina kişfan û di ber çav re derbaskirina çavkaniya nivîskî, herweha piştî lêkolîna qadê pênaseya destkeftîyên ku di encama hevpevînên pisporan de derketine holê û nirxandinên bersivên ku li gorî pirsa jorhatine kirin, nexşeya encama lêkolînê derxistin. Di qadên lêkolînê de tevgerên li jêr di nav tevgerên jinên Tirkîyê da hatin pênase kirin:

- Tevgera Femînîst
- Tevgera Jinan a Kemalîst
- Tevgera Jinên Kurd [2]
- Tevgera jinan a Oldar-Muhafezekar
- Tevgera LGBTI

Ev tevgerên ku di vê lîsteyê de hatine nîşandan, divê wek tevgerên ku di nav wan de qet danûstendin tunebe, neyên femkirin, ligel vê ev nexşandin di rastiya xwe de seknên cuda yên tevgeran bi awayekî giştî dide ber çav. Nexşên bi vî awayî hatine katagorîze kirin, di gelek xebatên akademik de dikarin bên dîtin (wek mînak: Çaha 2013; Diner& Toktaş 2010; Şimşek

[1] Di raporê de li nivîsên III.3.A. „Mijarên ku li Tirkîye tevgerên jinan ji hev cihê dikin û dikin yek“ (Polatdemir 2017) û III.3.B. „Koalîsyonên Jinan ên li Qadên Lêkolîne“ (Binder 2017) binerin.

[2] Ji bo Tevgera Jinên Kurd li nivîsa III.2.B. „Tevgera Jinên Kurd a li Tirkiyê û Serpêhatiya wê ya Xuyakirinê“ (Azizoglu-Bazan 2017) binerin.

2004;). Koma Projê di xebatên xwe yên Atolyeyan de, – yekemîn di Nisana 2016’an li Enqerê ya ku bi peşêngtiya KASAUMê (Enqerê Üniversitesi- Kadın Sorunları Araştırma ve Uygulama Merkezi) hat li darxistin û duyemîn Cotmeha 2016’an li Bremene; ji bo ku di navbera akademîsyên û aktîvîstên ku di beşa zayenda civakî û polîtîkayên jinan de li Almanya û Tirkiyê dixebitin tekîlî bê li dar xistin – li ser van kategorîyan nîqaş meşandin. Bi gelemperî mirov dikare bibêje ku akademîsyenên tevlî van atolyeyan bûn, anîn ziman ku; ji bo bi binavkirina piralîbuna tevgera jinan a Tirkîye bikaranîna peyva „Tevgerên Jinan“ dikare hêzên tevgêrên jinan teqez bike. Li ser ve esasê tevgerên ku di vê nivisê de hatine kategorize kirin, di hin xebatan de wek mînak di wekheviya zayenda civakî û mafên jinan de bi hev re tevdigerin, lê di hin xalan de jî sekna xwe cudatir didin xuya kirin. Ji Koalîsyona Jinan İlknur Üstün tîne ziman ku girîngiya piralîbunê di mijara „li ku derê bihevre tê meşandin li kudere na, em çiqas nêzî hev in an jî ji hev dûr in“ (Üstün 2014: 20)[3] de derdikeve hole û ev cudabûn herdem ji hev naye veqetandin. Disa li gorî Üstün „her tişt ne pir zelal e, hin tişt di nav hev de ne; ji bo wê jî pêwîst dike ku mirov hîn hûrtir li ser bikole.“ (Üstün 2014: 20)[4] Li ser vê esasê projeya lêkolînê û ev nivîsa ku di çarçoveya vê projeye de derketiye holê, divê wek hewldanek nexşandina tevgerên jinan ên cuda ku di çarçoveya vê projeyê de derketine holê were dîtin. Di vê nexşeyê da derbasdariya navbera tevgeran divê wek faktorekî giring li berçav were girtin.

1.1 Tevger(ên) Femînîst

Wekî ku Bihter Somersan di xebata xwe ya bi navê „Feminismus in der Türkei“ (Femînîzma li Tirkîyê) de tîne zimên, Tevgera Femînîst di salên 1980’an de gihîşt asta girsebûnê û di salên 1990 û 2000’an de jî, ji bilî siyasetên hevkarî û piştgiriyê ji nîqaşên derbarê rexistinênbûnên civakî, profesonelbûnê û di derbarê nîqaşên femînîzma projetiyê[5] gelek bi bandor bû. Nîqaşên li ser tekîlîyên hegemonîk a di nava tevgerê bi xwe jî bu sermijareke girîng (Somersan 2011: 86).[6]

---

[3] „Nerelerde birlikte hareket edilebilir, nerelerde edilemez, ne kadar birbirimize yakınız, uzağız meselesinde“
[4] „her şey biraz flulaşmış durumda, o keskinlikler çok büyük ölçüde kalkmış durumda, o nedenle biraz daha ayrımları inceltmekte fayda var“
[5] Femînîzma Projetiyê di nivîsa III.3.A. „Nezikatîyen tevgerên jinên Tirkîye ji hev cuda dikin û digihînin hev“ (Polatdemir, 2017) de di binnivîsa „Cudahiyên Rêxistinî / Sazî” de bi awayekî berfireh tê nîqaş kirin.
[6] Ji bo tevgerên otonom, sosyalîst, femînîst ên radîkal ên li Tirkiyê binêrin: Bora & Asena 2002; Çakır 2005; Akal 2011.

Dîtinên di derbarê Tevger(ên) Femînîst, di çarçoveya hevpeyvînên pisporan de nîqaşên li ser tevgerên jinan û femînîst de tê meşandin de zelal dibe. Ev nîqaş di vê raporê de di beşa III.1.B. „Tevger(ên) Jinan ên Femînîst: Ji bo pisporên jin û zayenda civakî pêşnîyarên pênaseyê“ (Binder 2017) de tê dest girtin. Dîsa ev berhevanîn nişan dide ku di hemû lekolîn û xebatên derbarî jinan de di çarçoveya gotin û naverokan de bi awayekî aktuel girêdayî xebatên din tê nîqaş kirin. Di beşa III.1.B. de bi giştî li ser mijara femînîzmê û tevgerên jinan hate sekinandin. Lê di vê beşê de zêdetir li ser têgihiştinên pisporan ên di derbarê Tevgera Femînîst de dê were sekinandin. Ji ber ku di herdû beşan de xalên hevbeş û cuda bi awayekî zelal nikarin ji hev bên veqetandin, bi zanebûn di herdû xebatan de jî nîvîs nehatin rûber kirin. Ji bo vê yekê hevgirtina pênaseyên tekoşîna jinên çepgirt/sosyalîst û tekoşîna wan a nav tevgera jin dikare wek sedem bê nişan dayîn.

Di bin sernivîsa vê beşê de ger bi kurtasî be jî em li ser Tevgera Femînîst rawestin; Tevgera Femînîst ji alîyê aktîvîst û akademîsyenên ku bi wan re hevdîtin hatin çêkirin cuda cuda tê dest girtin. Hin balê dikişinin ser gelemperiya Tevgera Femînîst û dibêjin Tevgera Femînîst divê tevahîya tevgerên jinan bigire bin siya xwe, an jî digire (Bora 2014: 18; Cön 2015: 14). Hin kes jî li dijî vê dibêjin tevgera jinan û ya femînîst cuda ne, divê ji hev cuda werin dest girtin. (Sancar 2014: 22; Üstün 2014: 26). Li alîye din jî hin pispor dibejin, di navbera herdû aliyan de sinorekî tûj û zelal nikare were kişandin (Acar 2014: 8; Özkazanç 2014: 4; Semiz 2014: 20; Keleş Yarışan 2015: 16). Her çiqas ev dîtinên cuda piralîbunê dîyar bikin jî, di heman demî de di warê tevgera jin û femînîzmê de dîtin û seknên aktorên ku tevlî hevdîtinan jî bûne dide xuya kirin. Di vê mijarê de nirxandina Nebahat Akkoça ji KAMERê ya li bajarê Diyarbekirê di derbarê pirserîbûna pênaseyên Femînîzme de mînakekî balkêş dide xuya kirin:

> Ji bo min pênaseya femînîzme ne yek e, ez bi gotinê bell hooks pir bawer im; [ew] dibêje ‚li dinyê bi qasî hejmara mirovên femînîst pênaseyên femînîzmê hene‘ û ji xwe sedema berfirehbûna me jî [ew e ku] me li her bajarî pênaseyên femînîzmê bi wan jinan da kirin. (Akkoç 2014: 43)[7]

Her çiqas, nêrîna ‚jin xwedî statuya zayenda duyemin e û zayenda ku tê pelçiqandin e‘ him ji

[7] „Benim için feminizmin tanımı bir tane değil, bell hooks'un söylediğine çok inanıyorum; ‚dünyadaki feminist insan sayısı kadar feminizm tanımı vardır‘ diyor ve zaten bizim bu bölgede yaygınlaşmamızın, yaygınlaşabilmemizin en önemli sebeplerinden biri, her ilde feminizmin tanımını o kadınlara yaptırdık.“

hêla tevgerên jinan û him jî ji yên femînîst bê xwedî derketin jî, ji *Amargî*ya li bajarê Enqerê Aksu Bora bale dikişîne ser rola giring a femînîzmê ku di warê pênasîna pelçiqandinên cuda de hîşyarbûnê çêdike û van yekan digihîne qada tekoşînê.

> [...] Li gorî min cudabûna femînîst bûnê, ev rewşên cuda yên jin-bûnê ne, rewşa pelçiqandinên cuda ne, ne tenê pelçiqandinên girêdayî zayendî [ne]. Teorîyekî femînîzmê ku dikare di navbera van de tekilîyekî deyne heye û girêdayî vê dikare bibe tevgereke polîtîk. (Bora 2014: 18)[8]

Di çarçoveya vê gotinê de li gorî Aksu Bora bingeha Tevgera Femînîst a teorîk derdikeve pêş: Tevgera Femînîst di navbera pelçiqandinên cuda de tekîlîyekê teorîk datîne. İlknur Üstün jî mîna Aksu Bora di dîyarkirina polîtîkayê de balê dikşîne ser rola Tevgera Femînîst (Üstün 2014: 50). Alev Özkazanç jî tîne ziman ku; mîna kifşkirina polîtîkayen femînîst, cudabûna nav tevgêrên jinan jî, ji dawxazên femînîst ên cuda pêk tên û pêşnîyar dike ku ev hemu bihev re werin dest girtin.

> […] lê belê di nav de îdeolojîyên cuda, nêzikatiyên cuda, daxwaz û gumanên cuda hene. Di vî warî de cudabûn heye. [Ez] pêşnîyar dikim bila ev hemû bihev re werin dest girtin û bi cudahiyên wek 'femînîzma rast ev e […] ya şaş ev e,' naxwazim bifikirim. (Özkazanç 2014:4)[9]

Ligel seknên cuda yên di nav Tevgera Femînîst û piralîbûna ku van seknên cuda derdixîne holê, bi girîngî bal li ser rola berhevker a Tevgera Femînîst jî tê kişandin (Özkazanç 2014: 4; Üstün 2014: 50).

Serpîl Sancar Tevgera Femînîst giranî wek tevgereke ku li hemberî zîhnîyeta zilam tekoşîneke ideolojîk dimeşîne, pênase dike û tîne ziman ku armanca tevgerê ji bo pekanîna zayenda civakî ya wekhev tekoşîn kirin e. „[…] Tevgera Femînîst zêdetir […]paş ve xistin û tune kirina desthilatdarîya zilam digire ber çav, ango zêdetir bi sîstematîk, binyatî û bi baviksalarî re rû bi

---

8 „[…] Feminist olmanın farkı bence bütün bu farklı kadınlık durumları, farklı ezilme biçimleri, sadece cinsiyetle ilgili olmayan ezilme biçimleri. Bunların arasındaki bağlantıları kurabilen bir teorisi var feminizmin ve bu teoriyle bağlantılı bir politik hareket haline geliyor."

9 „[…] Ve tabi ki içinde ideolojik farklar, tarz farkları, tutum farkları, ilgiler, kaygılar bu açıdan farklılaşmalar var. Bunların hepsini bir bütün olarak bakmayı öneriyorum ve doğru feminizm budur […] yanlışı şudur diye ayrımlarla düşünmemeyi tercih ediyorum."

rû tekoşînê bi rêxistin dike.“ (Sancar 2014: 28)[10] Özlem Şahin Güngör ji Zanîngeha Sıtkı Koçman a bajarê Muğlayê jî di heman demî de di çarçoveya wekhevîya zayenda civakî û guhertina civakî de balê dikişîne ser armanca tekoşîna Tevgera Femînîst:

> […] Dema ez dibejim Tevgera Femînîst ez behsa seknekî politik, ku li hemberî pirsgirêkên newekhevîya zayenda civakî jinan bi rexistin dike û bi vî awayî jî civakê diguherîne dikim […]. (2015: 26)[11]

Ji Bajarê Muğlayê aktîvîsta femînîst Gaye Cön jî behsa pîvanên rexistinkirinê dike û xalên wek hevûdin naskirin, hezkirin û li ser esasa wekhevîyê bi hevrebûnê wek nirxên femînîzme yên ku nayên guhertin şîrove dike: „[…] pîvana rexistinbuyîna femînîzmê […] ku cudakirinê red dike heye. Rexistina femînîst hîyerarşîye red dike, cudakirinê red dike, ji ku derê tê bila bê şîdetê red dike, tiştek weha xwedî pîvan e.“ (Cön 2015: 14)[12]

Wekî ku beşdervan Tevgera Femînîst digirin dest û bi giranî tînin zimên; divê dînamîzma guhertina civakê ya Tevgera Femînîst hebe û di vê çarçoveyê de xwe bi rexistin bike. Her çiqas rastîyeke polîtîkayên femînîst a ku seknên femînîst ên cuda derxîne pêş hebe jî, di mijarên wek wekhevî, mafparastinê de li hev dikin û di vê çarçoveyê de xwedî perspektîfekê ne, ev yek ji hêla beşdarvanan ve jî tê dest nişan kirin.

Tevgera Femînîst a çep/ sosyalist

Komekê din a ku di hevpêvînên pisporan de ji bo têvgerên jinan wek mînak tê dayîn û di nav tevgerên jinan ên li Tirkîyê de derdikeve pêş, Tevgera Femînîst a çepgirt/sosyalist e. Li gorî di hevpeyvînan de tê ziman, nûnerên Tevgera Jinên Kurd jî bi vê grûbê re di nav tekîlîyekê nêzik de ne (Aras 2015: 12). Ev kom bi giranî ji aliyê aktorên ku ji nava tevgerên çep hatine, hatîye ava kirin û xwe hîn jî nezî wan dibinin (Atasü Topçuoğlu 2014: 23). Mirov dikare jinên ku di nava partîyen çep an jî yên sosyalîst de tekoşîn dimeşînin jî di bin vê komî de binirxîne. Lewre

[10] „[…] Feminist hareketi daha […] kendi odağına erkek egemenliğini geriletmek ve yok etmeyi alan, yani daha sistemsel, daha yapısal, daha patriarka ile yüz yüze gelen şeyleri örgütlemek olarak alıyorum.“.

[11] „[…] Feminist hareket dediğimde aslında ciddi ciddi toplumsal cinsiyet eşitsizliği sorunları karşısında politik bir iradeyle ve bizzat kadınların örgütlenerek [toplumu] dönüştürmeyi hedeflediği […] örgütleri kastediyorum […].“

[12] „[…] feminist örgütlenmenin, […] ayrımcılığı reddeden […] ilkesi vardır. […] Feminist örgütlenme yapısal hiyerarşiyi reddeder, ayrımcılığı reddeder, şiddet nereden gelirse reddeder, böyle ilkeli bir şeydir.“

ji *Uçan Süpürge*yê Selen Doğan vê rewşê weha dinirxîne: „Nasnameyên wan ên cuda hene, angajmanên wan ên polîtîk ên cuda hene, lê li alîye din di nav tevgera jinê de ne û li wir tiştekî femînîst hildibêrînin û vê zêde dikin.“ (Doğan 2014: 30)[13]

Mirov dikare bibêje jinên ku di nav tevgerên çep û partiyan de bi zilam û zihnîyeta baviksalarî re nakokî jîyan kirine, di pêşketina Tevgera Femînîst de rolekî girîng lîstine. Dema em li ser vê esasê behsa Tevgera Femînîst a çep dikin, li gorî Gülsen Ülker a ji Weqfa Piştgiriya bi Jinan a ji şaxa Enqerê; jinên ku beriya 1980'yan di bin siya rexistinên çepgirt û sosyalîst de hatine rêxistin kirin, mînak Komeleya Jinên Pêşverû *(İlerici Kadınlar Derneği IKD),* di salên 1980'yan de „li ser tecrubeyên xwe hatine cem hev û ev tevger derxistine holê.“ (Ülker 2014: 17-18)[14] Jinên ku di nav partîyên çep de cîhe xwe girtine, di nava IKD de ne ji bo partîya xwe, zêdetir wekî meclîsê rojeva xwe girtine dest û nîqaş meşandine (Ülker 2014: 24). Partîyen mîna SDP (Partîya Sosyalist a Demokrat), ÖDP (Partîya Azadî u Hevgirtinê), HDP (Partîya Demokratik a Gelan) dikarin wek mînak bên jimartin û derveyî wan, sendîkayên ji rexistinên têkel zayendî, mîna Eğitim-Senê, dikarin wekî mînak bên dayîn (Özkazanç 2014: 3; Ülker 2014: 17-18).

Ji bo rêxistinên jinên femînîst ên serbixwe ku xwedî fikrekî „sosyalîst û çepgirt“ in (Özkazanç 2014: 31), mirov dikare saziyên wek Kolektîfên Jinên Sosyalîst ku li Enqerê, Stenbolê û li cuda deverên Tirkîye xebat dimeşînin, dîsa Kolektîfa Femînîst a Enqerê û Kolektifa Femînîst a Stenbolê wek mînak nişan bide (Özkazanç 2014: 31). Li gorî Alev Özkazanç ev Kolektîf „polîtîkayeke jinan a serbixwe pêş dixînin, pêk tînin û bi bandor in.“[15] Dîsa nivîs û hevpêyvînen Alev Özkazanç, ku bi nasnameya xwe ya aktîvîst û akademîsyen dinivîsîne, di kovara „Femînîst Polîtîka“ya ku ji aliyê Kolektîfa Sosyalîst Femînîst ve tê derxistin de, tên weşandin (Özkazanç 2014: 31). Di çarçovaya bajarên ku lekolînên qadan lê hatine kirin de, ji ber bandora xebat û aktîviteyen Kolektifê, ji bajarê Muğlayê femînîsta vegan Zeze jî kolektîfê dişopîne (Zeze 2015: 22). Ev yek nişan dide ku bandora Kolektifê sînorên bajaran derbas dike. Ji Enqerê aktîvîsteke „Kolektîfa Sosyalîst Femînîst“ koma ku bi xwe jî di nav de ye, bi vî awayî tîne ziman: „SFK wek mînak hinek ji derveyî vê gotina girseyî ya tevgera jinê ye; wek mînak rêxistineke ku giringiyê

[13] „Başka kimlikleri var, başka politik angajmanları var ama bir anlamda kadın hareketinin de içindeler ve orada feminist bir şey üretiyorlar ve bunu çoğaltıyorlar.“
[14] „Kendi deneyimleri üzerinden bir araya gelmesi ile oluşmuş bir hareket.“
[15] „Bağımsız kadın politikası üretiyorlar, yapıyorlar ve etkililer.“

dide keda jinê û li ser vê esasê xebatan dimeşîne“ (Anonîm 2014: 33)[16] û bi vî awayî kolektifê li hemberî kapîtalîzmê û di sîyasetê de di xeta çep de bi cîh dike (Anonîm 2014: 33). Vê aktîvîstê mijarên ku Kolektif digire dest, bi nav dike û ji rexistinên femînîst cudatir sekna xwe ya îdeolojîk tîne zimên.

Ji bajarê Enqerê Sevînç Hocaoğulları ku li ser navê Jinên Malên Gel *(Halkevci Kadınlar)* hevpêyvîn pê re hat çêkirin, dibêje „em di wê baweriyê de ne ku jin di vê demê de bi giştî li hemberî polîtîkayên neoliberal, li hemberî wendebuna mafan tekoşîn dimeşînin û di vê tekoşînê de pêş dikevin.“ (Hocaoğulları 2014: 16)[17] Bi vî awayî tekoşîna Femînîst ku bingeha xwe ji îdeolojiya xwe ya çep digire, xeta xwe ya parastinê li hember pirsgirêkên polîtîkayên neolîberal datîne (Hocaoğulları 2014: 16). Ev daxuyanî di heman demî de nişan dide ku jinên Malên Gel di xeta çep de di nav tevgera jinan de cîhe xwe digirin û tekoşînê dimeşînin. Ji sendikaya perwerdeyê Eğitim-Senê, ya bajarê Muğlayê Dilek Gedik bale dikişine ser jinên sosyalist ku tevlî tevgerên jin dibin û dibin aktorên Tevgera Femînîst a çep û dibêje hemû jinên di salên 1980 û 1990’an de „di nava tevgêrên çep an jî sosyalîst de cîh digirtin, neha hemû di nav Tevgera Femînîst da cihe xwe digirin.“[18] (Gedik 2015: 9)

Di xeta cudabunê ya navbera Tevgera Femînîst û çep de „nakokiya çînî“ xala navendî dîyar dike. Li gorî Nurcan Vayîç Aksu, ku weke aktîvîsteke çep di Platforma Jinan a Hopayê de –ku neha tenê wek komekê facebookê hebûna xwe berdewam dike- li ser navê Meclîsa Jinên Sosyalîst cîhê xwe digire, pirsgireka jin û tekoşîna sosyalîst ji hev ne cuda ne. Vayiç Aksu dest nişan dike û dibêje, nasnameya jin ji nasnameya bedenî zêdetir divê bi nasnameyeke çînî ve were girêdan û herweha têvgerên jin bi siyaseta çep re bibin yek. Li gorî wê di tekoşîna jinê de nîqaşên çînî giring û pêwîst in.

> […] tevgereke jin nikare bi tena serê xwe [bi tekoşîna] li hemberî şîdetê, destdirêjiye […] pêş bikeve. Divê nasnameyekê ku hemiyan bigire nava xwe

[16] „SFK mesela genel olarak kadın hareketi dediğimiz o total şeyin biraz dışında, mesela kadın emeğini de önceleyen, kadın emeği konusunda da çalışmalar yapan bir örgütlülük“
[17] „Kadınların bu dönem temel politikleşme alanlarının bu neoliberal sömürüye karşı, neoliberal hak kayıplarına karşı gelişen mücadeleler, hak mücadeleleri içerisinde geliştiğini düşünüyoruz.“
[18] „Kendini solda tanımlayan sosyalist kadının çoğu feminist harekete kaydı.“

> hebe. Ew jî li gorî min divê di nava siyaseta çepgirt te bigîhin hevdû ku, [tevgera jin] karibe bi awayekî çînî xwe bi cih bike. (Vayiç Aksu 2015: 15)[19]

Tekoşîn û Tevger(ên) Hawirdorê (Ekolojî)

Di encama hevpevînên pisporan de derket holê ku, – ji derveyî Femînîstên Vegan ên Muğlayê – ji hebûna Femînîsten Hawirparez, ku di xebatên xwe de zayênda civakî û tekoşîna jinê esas digirin, behs kirin gelek zehmet e. Dîsa jî weke encameke pewîst di hevpêyvînên pisporan de kesen ku xwe wek aktîvîst û akademîsyenên femînîst binav dikin, pirsgirêka hawîrdorê jî di nav tekoşîna jinê de dinirxînin. Li ser vî esasî pirsgerêka hawirdorê ji bo Tevgera Femînîst û jinan wekî kategorîyeke jêrîn dikare were nirxandin. Li gorî Sevinç Hocaoğulları mijara hawirdorê qadekê ku jin lê polîtîk dibin û tê de roleke sereke dilîzin e. Li gorî Hocaoğulları:

> dema ku [jin] ji bo xwedîderketina gundê xwe, an jî derdora xwe, an jî xweza û çema xwe derkeve peşîya bendan, an jî dozeran di rastîya xwe de di riya azadbûn û serekebûnê de gavek diavêje. (2014: 16) [20]

Ji koalîsyona Jinan İlknur Üstün jî bale dikişine ser tekîlîyen aktîvîstên tevgerên jinan û tevgerên hawirparêz û ji ber vê yekê dibêje, mirov dikare bi perspektîfa wekhevîya zayendî û femînîst li mijara hawîrdorê binêre (Üstün 2014: 12). Ji *Uçan Süpürge*yê Selen Doğan jî mijara hawîrdorê di nava pênasîna jin û femînîstbûnê de digre dest. Li gorî Doğan ji bo parastina jiyaneke bi rumet divê hawîrdor wekî nirxekê were dest girtin (Doğan 2014: 28). Handan Çağlayana ku him li Zanîngeha Enqerê fêrker e û him jî di nav karên sendîkayê de cîhê xwe digire, sedema taybetiyên tekoşîna ekolojik, ku divê him antîkapîtalîst be û him jî wekheviya zayendan di nav xwe de bihewîne, bi vî awayî tîne ziman:

> Ger hûn ji bo hevsengiya ekolojiyê tekoşîn bidin, hûn nikarin bandora kapîtalîzmê ya neyinî pişt çav bikin, [...] [hûn nîkarin] pişt çav bikin ku sîstema kapîtalîst di heman demî de baviksalar e. (Çağlayan 2014: 26)[21]

---

[19] „[...] Tek başına hani bir şiddete, bir tecavüze karşı çıkmakla da [...] bir kadın hareketinin çok ileri gidemeyeceğini düşünüyorum. Tüm bunun birleşeceği bir kimlik olmalı. O da bence sol siyasette birleşmesi gerekiyor ki, sınıfsal olarak da kendi yerini koyabilmeli diye düşünüyorum.“

[20] „Kendi köyüne veya çayına veya doğasına veya ırmağına sahip çıkmak için, o barikatın önüne geldiğinde, o dozerin önüne geçtiğinde, aslında özgürlük ve özneleşme yolunda bir adım atmış oluyor“

Wek Çağlayan ji Komeleya Piştgiriya bi Jinan a Trabzonê Nilüfer Akgün jî mîna aktîvîsteke balê dikişîne ser giringiya hawirdorê û dibêje, kesên ku di nav tevgera jinan da cîh digirin, divê hemberî hawîrdorê jî bi baldarî nêzîk bibin û divê mijara hawirdorê wek xeteke tekoşînê ya tevgera jinan bê dest girtin (Akgün 2015: 14). Di vê çarçoveyê de bi kurtasî mirov dikare bibêje ku tevgerên jinan (ên femînîst) û hawîrdor hevudû xwedî dikin. Çawa ku kesên di nav tevgerên jinan de ne, mijara hawîrdorê bi perspektîfeke femînîst digirin dest, kesen xwedî hişmendiya hawîrdorê ne, dikarin li ser esasa mijara hawirdorê bi tevgerên jinan re bikevin tekîliyê. Bi vî awayî mirov dikare bahsa sentezekî ku ji tevgera jinan û hawirparêzan pêk tê, bike.

Di nav bajarên wek qadên lêkolînê hatin hilbijartin de, yên ku mijara hawîrdorê wekî xeteke tekoşînê digirin dest û di vê çarçoveyê de derdixînin pêş bajarê Muğlayê û bajarên Deryaya Herema Reş in. Li gorî femînîsta vegan Zeze tekîliyên tevgerên jinan a Muğlayê bi ekolojiyê heye (Zeze 2015: 32). Herweha ji Sendîkaya Perwerdeyê Eğitim-Senê Dilek Gedik jî projeya tovê ku wek projeyeke heremî di bin sîya meclîsa jinan a konseya bajêr de hatîye lidar xistin wek mînak nîşan dide. (Gedik 2015: 25). Li gorî akademîsyen Özlem Şahin Güngör li herema Muğlayê ji her qadê jin li hember hawirdorê bi hişmendî tev digerin: „Guman e ku hûn cîhekî din ku lê Tevgera Femînîst û ya jinan [wek vir] ewqas bi hev re aşitiyane jiyan dikin, bibinin.“ (Şahin Güngör 2015: 44)[22]

Di hevpeyvînên Deryaya Reş de jî derdikeve holê, çawa tevgerên jinan ên heremê li tekoşîna hawîrdorê xwedî derdikevin. Filiz Karakuşa ji *Eğitim-İş*ê ya bajarê Artvînê tevlîbûna jinan a tekoşîna hawîrdorê ya Herema Deryaya Reş bi zanebûna derbarê têgîhîştina xwezayê dinirxîne û dîsa nav hev re derbasdariya jiyana rojane û ya xwazayê jî wek sedemekî girîng binav dike:

> Ji ber ku Artvîn cîhekî gelek xwezayî ye û mirovên li vir hînê bi xwezayê re jiyanê bûne […] naxwazin ev xweza wende bibe û wek dayik ji zarokên xwe hez dikin, dizanin ku dema ev xweza wenda bibe dê malbatên wan zirarekî mezin jê bibînin. Ji ber vê yêkê gelek li ser vê mijarê disekinin. […] Sedema ve

[21] „Ekolojik dengenin korunması için mücadele veriyorsanız, kapitalizmin ekoloji üzerindeki olumsuz etkilerini göz ardı edemezsiniz, […] kapitalist sistemin aynı zamanda ataerkil olduğunu da göz ardı edemezsiniz.“

[22] „Galiba feminist hareketle ekolojik hareketin bu kadar barışık olduğu bir coğrafya daha bulamazsınız.“

> yekê jî kesê ku [neha] seroka rêxistina hawirdorê ye, jinekê ye û ev jin li Artvînê gelek tê naskirin [...] li gorî min di mijarê hawirdorê de, di serî de hebûna jinekê gelek bawerî dide wan. (Karakuş 2015: 50- 51)[23]

Li gorî Karakuş, ji ber ku serkêşiya tekoşîna hawirdorê aktîvîsteke jin dikşîne, gelek jin tevlî tekoşînê dibin. Dîsa jî pewîst e bê ziman, ev gotinên jorîn di naveroka xwe de jinê wekî kirdeyekê, ku xwezayê diparêze, dinirxîne. Disa girêdayî vê ev nirxandin di tevgerên civakî de rola aktorên jin wekî model derdixine pêş. Li gorî Melike Arduç û hevalên wê ji Hopayê, ji ber ku zerara li ser xwezayê digihîje jinan, jin di tekoşîna hawirdorê de li pêş cîhe xwe digirin. „Ji ber ku di çayê de jî [...] di talankirina newalan de jî dîsa yên ku eş dikişînin jin in. [...] Ji ber vê sedemê jî jin zêdetir li pêş in, di asta pêşeng de tekoşînê dimeşînin.“(Arduç û yên din 2015: 4)[24]

Arduç sedema tespîta ku jin li hemî Tirkîyê di qada pêşî de di nav tekoşînê de cîhê xwe digirin, bi vî awayî şîrove dike: „Ji ber ku di hemû pirsgirêkan de jin zêdetir tehdê dikşîne, berxwedaneke derdikeve holê û jin di qada peşî de cîhe xwe digire.“ (Arduç û yên din 2015: 4)[25] Bi heman awayî ji Platforma Piştgiriya bi jinan a Artvînê Nurcan Ay Katırcı di wê baweriyê de ye ku li Artvînê her kes, ji hemî temenan jin tevlî tekoşîna hawirdorê dibin, lewre ev mijarekî „gelek girîng e.“ (Ay Katırcı 2015: 40)[26]

Tekiliyeke gelek xurt di navbera hawirdor û qada erdnîgariyê de heye. Li ser vî esasî faktora hawirdorê ji bo tevgera jinan li gor qadan weki xeteke tekoşîne derdikeve pêş. Her çiqas – di çarçovaya vê xebatê de – tevgereke jin (a femînîst) a hawirdorê ku li tevahîya Tirkîyê bi bandor û di nava tevgera civakî de cîhê xwe digire, derneketibe holê jî, di asta hereman de bi taybetî jî di mijara hawirdorê de komên jinan xeteke tekoşînê ya girîng dimeşînin.

---

[23] „Çünkü Artvin çok doğal bir alan olduğu için ve bu doğa ile yaşamaya alıştıkları için bu insanlar [...] bu doğanın kaybolmasını istemiyorlar ve çocuklarını seviyorlar anne olarak ve biliyorlar ki bu doğayı kaybettikleri zaman ailelerine de çok büyük zararlar gelecek. O yüzden bu konuya çok fazla el atmış durumdalar. [...] Bunun nedeni de biraz çevreci örgütün başındaki kişinin kadın olması ve Artvin'in önde gelen kadınlarından biri olması [...] bence onları yüreklendiren bu çevreci durumda, başındakinin kadın olması.“

[24] „Çayda da [...]derenin talanında da, derenin gasp edilmesinin sıkıntısını yaşayan da kadınlar olduğu için [...] daha çok ön planda oluyor doğal olarak kadınlar, ön planda mücadele veriyorlar.“

[25] „Her sorunda kadınlar daha çok sıkıntı çektiği için bir direniş ortaya çıkıyor, kadınlar ön saflarda olur.“

[26] „Çok hayati bir mesele“

1.2 Tevgera Jinan a Kemalîst

Bi derketina nîqaşên derbarê sergirtinê[27] ya salên 1990'î (Çolak 2008) û pêşketina tevgerên Oldar-Muhafezekar ji nû ve pêşiya rexistinbuyînên jinên wek Kemalîst/Komarparêz, laîk/sekuler tên binavkirin, vekir (Arat 1994: 246). Aktorên ku di nav vê tevgerê de aktîf in, him di warê hiquqî û civakî de wekhevîya jinan dikin mijar û him jî bikaranîna nirxên Kemalîst diparêzin. Ev komên jinan ku nirxên Tevgera Femînîst a wekheviyê diparêzin; di bin sîwana komel û klûbên ideolojiya Kemalîst de kom dibin, derfetên perwerdê û navendên şewirmendiyê ji bo jinan, bi taybetî jî ji bo heremên bejahîya Tirkîyê ji xwe re dikin armanc (Somersan 2011: 102). Mirov dikare bibêje ku ew paternalîzma Ataturkparêz bi awayekî maternalîst şîrove dikin. Wekî din ji bo aktîvîstên jin ên vê tevgerê di jîyana kar û perwerdê de gîhiştina mafên hevbeş, temsîlîyeta jinan a nava sîyasetê jî xalen gelek girîng in.[28]

Ev aktor jî di hevpeyvînan de li ser pirsa „hûn li Tirkiyê kîjan tevgeran di nava tevgerên jinan de dihesibînin?“ bi nirxandinên cuda weki mînak hatin nîşandan. Her çiqas di gelemperiya hevpeyvînan de gotina ‚Tevgera Jinên Kemalîst‘ neyê bikaranîn jî, di axaftinan de „Yekîneyên Dayîkên Tirk“, „Yekîneyên Jinên Tirk“ di asta rexistinbunê de bi nasnameyên xwe yên Kemalîst derdikevin pêş (Atasü Topçuoğlu 2014: 23; Üstün 2014: 34). Ev tevgerên jinan bi binavkirinên wek Kemalîst, Komarparêz, Laîk tên îfade kirin û di derbarê wan de nirxandinên cuda tên kirin. Mînak Hatice Kapusuz Kütküt ji Komeleya Piştgiriya bi Namzetên Jin a ku li Enqerê pê re hevdîtin hatibû çêkirin, ji Tevgera Kemalîst wek „tevgereke jinan, ku xwe xwedî li nirxên komarê derdikevin binav dikin“ (Kapusuz Kütküt 2014: 23)[29] qal dike. „Tevgera Jinên Laîk“ (Bostan 2015: 18)[30] jî wek pênasayekê din di nav têgehan de cîhe xwe digire. Ji Zanîngeha Muğla Sıtkı Koçman Özlem Güngör Şahin jî di axaftina xwe de dibêje ku, „Milê jinan a Partîya Gel a Komarê (CHP), êdî ew jî bûn parçeyekê ji tevgera jinan. An jî êdî em [behsa] cudahiyên wek femînîsten îslamîst, femînîstên radîkal, femînîstên Kemalîst dikin.“ (Güngör Şahin 2015:

[27] Ev mijara ku wekî mijara sergirtinê tê nirxandin, li Tirkiyê mijareke sereke ya nîqaşê ye. Ji salen1990'an vir de jinên ku ji ber qedexeya sergirtinê mexdûr bibûn, di sazîyên mîna zanîngehan de ji bo rakirina qedexê û giredayî vê neheqîya li hemberî tercihên zayendî an jî olî wekheviyê daxwaz dikirin (Göle, 1996). Di dema rêveberiya hikumeta AKP de ev qedexe gav bi gav ji holê rabû.

[28] Di derbarê Tevgera Femînîst Kemalîst/ Komarparez, Laîk/sekuler de ji bo agahiyên berfirehtir li Arat 1997; Özdemir 2010; Persentili 2013 binêrin.

[29] „Cumhuriyet değerlerine sahip çıkıyor olarak kendisini tanımlayan kadın örgütleri“

[30] „Laik kadın hareketi“

26)[31] Bi vê nirxandina xwe ew jî Tevgera Jinan a Kemalîst/Komarparêz di nav tevgera jinan de dihesibîne. Dema qala cudabûnan jî tê kirin, tevgerên jinan wekî parek ji tevahîyê tên dest girtin û ev beş bi van taybetîyan derdikevin pêş çav. Di heman demê de İlknur Üstün, ku li ser navê Koalîsyona Jinan a Enqerê bi me re hevdîtîn çêkiribû jî dema behsa komên cuda dike, dibeje: „Ji Tevgera Jinên Kurd jin hene, jinên oldar hene, ji tevgera LGBT jin hene, femînîst hene, Kemalîst hene.“ (Üstün 2014: 12)[32] Ev herdû mînak nîşan didin ku „jinên Kemalîst“ him di nava tevgerên jinan ên Tirkiyê de, him jî di nav Koalîsyona Jinan, ku ji gelek aktîvîstên cuda li Enqerê pêk hatîye, de weki xetekê tê xuya kirin. Jineke akademisyen, ji Zanîngeha Pamukkaleyê jî jinên Kemalîst bi karekterên wan ên netewperest dinirxîne û wan „beşeke netewperest a tevgera jinên netewî“ (Anonim 2015: 29)[33] binav dike. Piraniyên hevpeyvîneran bi rasterast Tevgera Kemalîst bi nav nakin, lê belê behsa rêxistinên jinan ên ku di çarçoveya mafên nûjen a jinan de, di mijarên perwerdeya keçikan û tevlîbûna jinan a jîyana kar de dixebitînin. Pênaseyên derbarê Kemalîzm û laîktiyê, him bingeha sernivîsa vê beşê û him jî esasa binavkirina „Tevgera Jinan a Kemalîst“ pêk tîne.

Jale Erena ji Komeleya Jinên Komarê ya Muğlayê, ku pê re hevdîtin hat çêkirin, armanca komelê bi kurtasî weha tîne zimên: „Parastin û pêşxistina destkeftiyên aborî, sîyasî, azadî û ronahiyê ku ji bo welat û gel bi şerê rizgarkirina netewî û şoreşa komarê hatine bi dest xistin.“[34] Eren xeta xwe ya polîtîk wek „him di nava tevgera jinê de, him jî ji aliyê siyasî de bi xwedî derketina nirxen şoreşê“[35] dide xuya kirin. Mîna ku di çavkaniyên nivîskî de jî derbas dibe, rêxistinên Kemalîst/ komarparez giringiyê didin perwerdeya jinên li gund û bejahiyê dijîn (Somersan 2011). Him Jale Eren ji Muğlayê him jî Nurten Karakış a ji Komelaya Parastina Mafên Jinan a şaxa Denizliyê di komeleyên xwe de giraniyê didin kar û xebatên ku civakîbûn û perwerdeya jinên li navçeyan xurt dikin (Eren 2015; Karakış 2015). Xebatên van komeleyan ku wekî komeleyên Kemalîst tên binavkirin, bi awayekî rexneyî tên şopandin û li gorî nêzikatiya dewleta Kemalîst wek *bihêzkirina ji jor de* (*top down empowerment)* tê nirxandin. Lê belê ev komele bi van xebatên xwe gelek hêz û derfet ji bo jinên Herema Egeyê diafirînin. Di

[31] „Cumhuriyet Halk Partisi Kadın Kolları, onlar da artık kadın hareketinin bir parçası olmaya başladılar ya da İslamcı Feministler, Radikal Feministler, Kemalist Feministler diye ayrımlar yapıyoruz.”
[32] „Kürt Kadın Hareketi’nden kadınlar var, dindar kadınlar var, LGBT hareketten kadınlar var, feministler var, Kemalistler var.“
[33] „Ulusal kadın hareketinin ulusalcı kısmı“
[34] „Ulusal Kurtuluş Savaşı ve Cumhuriyet devrimleri ile kazanılmış olan ekonomik ve siyasa bağımsızlığın, özgürlük, demokrasi ve aydınlanmanın korunması, savunulması, ülke ve halk yararına geliştirilmesi“
[35] „hem kadın hareketlerinin içinde hem de siyasi yönden de o devrimlere sahip çıkarak“

çavkaniyên nivîskî (mînak: Çağatay 2008) û di hevpêyvînen ku di çarçoveya vê lêkolînê de hatin kirin de ligel saziyên wek Komeleya Piştgiriya Jîyana Nûjen, Komeleya Konseya Jinên Tirk, Komeleya Jinên Xwendekarên Zanîngehan, Komeleya Jinên Komarê, Komeleya Parastina Mafên Jinan, Yekîtiya Jinên Tirk jî di nava rexistinên jinên Kemalîst de tên hesibandin.

1.3 Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar

Jinên Oldar-Muhafezekar di sala 1990'an de di kampanyaya hilbijartinê ya Partîya *Refah*ê de roleke girîng girtin ser mile xwe, bi taybetî ji bo azadkirina sergirtinê/serpûşiyê li zanîngehan derketin kolanan, di sîyasetê de pêşketin û bi daxwazên xwe û rexneyên ku li Tevgera Femînîst a salên 1980'yan kirin, di piralîbûna tevgera jinan de roleke girîng dilîzin. Tevgera jinan a oldar-muhafezakar ku ji salên 1980 vir de bi nivîsên xwe nezikatîyên femînîstan rexne dikin, bi taybetî helwesta rojavayî ya femînîstan ku li gorî wan bê ku di parzûnê de derbas bikin, nirxên femînîstên rojavayî esas digirin û girêdayî vê Ewropayê navend digirin, bi awayekî tund hat rexne kirin.[36] Di hevpêyvînan de Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar di bin navê Tevgera Jinan a Îslamîst, Tevgera Jinan a Misilman an jî wek Rexistinên Jinan ên Îslamîst tên binav kirin (Acar 2014: 22; Atasü Topçuoğlu 2014: 2; Özkazanç 2014: 22- 23).

Aktîvîst û akademîsyenên femînîst ên ku hevdîtin çêkirin, Tevgera Jinan a Oldar û Muhafezekar parçeyek ji Tevgera Jinan a Tirkiyê ku wê temam dike dihesibînin. Li gorî Alev Özkazanç – ji KASUM'a Zanîngeha Enqerê – her çiqas ew bi nêrîneke berfireh xwe femînîst nehesibînin jî wan di nav tevgera jinan de dibîne: „Jinên îslamîst an jî misilman bi hemû xebatên xwe yên derbarê jinan de, bi axaftinên xwe, tirsên xwe, nivîsên xwe bi her awayî di nava tevgerê de cîh digirin.“ (Özkazanç 2014: 22- 23)[37] Ji Zanîngeha Teknik a Rojhilata Navîn ODTU'yê Ferîde Acar „Tevgera jinan a îslamî“ bi vî awayî dinirxîne: „Li ser esasên olî xwe bi rêxistin dikin, […] ango xwe pênasekirina xwe ya esasî li ser olê dikin, lê belê [di heman demî de li ser esasa] mafên jinan dixebitin.“ (Acar 2014: 22) [38] Li gorî akademîsyen Serpîl Sancar

---

[36] Ji bo mijara jinên oldar- muhafezekar û femînîstên îslamîst li Göle 1996; Samandi 1997; Wedel 2000, Özçetin 2009 binêrin.

[37] „İslami ya da Müslüman kadınları da kadınlarla ilgili konuştukları, yaptıkları, kaygılandıkları, yazdıkları her durumda da hareketin içerisine tabi ki“

[38] „Dini esaslar üzerinden örgütlenen, […] yani öz tanımlamasını din üzerinden yapan ama kadın hakları bağlamında çalışan kadın hareketleri.“

taybetiyeke karekterîstîk a din a Tevgera Jinan a Oldar û Muhafezekar ew e ku wekî komekê li ser mijara jinan xebat dimeşîne, lê referansên xwe ji olê digire. Rolên jintî-mêrtî bi cudahiyeke xwezayî ve gire dide, ne keseyatiyê, lê malbatê esas digire (Sancar 2014: 34).[39] Ango zayenda civakî li ser esasa zayendiya bi du polî û biyolojîst dinirxînin. Hin aktorên ku tevlî hevpevînan bûn, Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar wek rêxistinêkê ku bi femînîsten îslamîst re kermes organize dikin, xebatên alîkarîye pêk tînîn, pêyva femînîst ji bo xwe bi kar naynin, pênase dikin. Li gorî wan ev rêxistin ji salên 2000'î şûn de hûrik hûrik ketin nav hewldanên rexistinbûnê, dû re di nav salan de tevlî beşa jinan a partîya AKP, an jî rexistinên din bûn (Atasü Topçuoğlu 2014: 23; Aras 2015: 12).

Di hevpêyvînan de hin aktîvîst mînakên tevgerên ku bi partîya hikumetê AKP re tekîlîyê de ne didin û ji ber sedema polîtîka û daxuyaniyên AKP bi taybetî yên salên dawî de li ser mijara jinê, tevgerên bi AKP re têkîldar in, di nava tevgera jinan de nahesibînin (Kalkan 2014: 17). Akademîsyen Ferîde Acar jî dide dîyar kirin ku tekîliya di navbera Tevgera Femînîst û Tevgera Oldar-Muhafezekar di salên dawî de lawaz buye. Vê rewşê jî bi serdestiya partîyeke oldar-muhafezekar ve girê dide û kurtasî diyar dike ku tevgera jinên îslamîst nikare xwe ji wê qut bike û sekna xwe herdaîm di berçav da derbas bike. Gelek aktivist dest nişan dikin ku ji ber sedemên mîna helwesta wan a derbarê hebûna jinê de û rewşa wê ya nav malbatê de û herweha sekna wan a li hemberî hikumetê gelek aktîvîst (femînîst) ji tevgera jinên îslamîst dûr disekinin.

Aktîvîstên ku di nava tevgerên jinan ên din de cîhê xwe digirin, di hevpêyvînan de pozîsyona Platforma Jinan a Paytextê bi taybetî jî di hevdîtinên li Enqerê de cuda dinirxînin (Atasü Topçuoğlu 2014: 23; Kapusuz-Kütküt 2014: 21). Reyhan Atasü-Topçuoğlu ya ji Zanîngeha Hacettepê Palatforma Jinan a Paytextê, ji rexistinên jinan ên ku xwe femînîst nahesibînin, bi giranî karê alîkariyê dikin û bi rîya kermesan xwe dimeşînin cuda digire dest (Atasü-Topçuoğlu 2014: 23). Berdevka Platforma Jinan a Paytextê Nesrin Semiz dide dîyar kirin ku organîzasyonên Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar bi piranî ji bo perwerde û alîkarîyê tên

[39] Nirxandinên derbarê ‚jin-bûn'ê de, ku bi nêzikatiyeke du polî civaka zayendî digirin dest, herweha du zayendîbûnê xwezayî, biyolojîst û ji xweda de hatiye afirandin dinirxînin, di heman demî de ji alîyê hin jinên aktivist ên ku di nava Tevgera Jinan a Kemalîst de cîhê xwe digirin jî tê parastin. Di derbarê vê mijarê de ji bo agahîyên berfireh hûn dikarin beşa III.1.A. „Peyveke navendî û wateya wê ya li qadên lêkolînê: ‚Jin bûn' "(Binder 2017) binêrin.

çêkirin û xwe bi vî awayî ji sazîyên jinên oldar cuda dike:

> Wek gelek komeleyên jinan, bi taybetî jî mîna komeleyên jinên oldar, [ku] perwerde û alîkarî[yê didin], bi taybetî jî alîkarî tune li ba me. [...] Alîkariyên perayan, bûrs û tiştên hwd. tune li ba me. Em raste rast tenê li ser polîtikayên jinan dixebitin. (Semiz 2014: 6)[40]

Di mijara hêzbûna jinê de pênaseya ‚alîkarî‘yê wek nêzikatiyeke pragmatîst dikare bê dîtin. Ji ber ku mekanîzmaya jinê ya ‚alikariya xwe bi xwe‘ ne domdar e û guhertina avasaziya civakê nake armanç, ji alîyê hin sazîyên jinan ve tê rexne kirin.

Hin aktîvîstên ku xwe di nav tevgera oldar- muhafezekar de nabînin, di wê baweriyê de ne ku îslam û tekoşîna jinê nikare were cem hev û li ser vê esasê bale dikişînin ser têkîliyên olî yên xurt ên di navbera jin û malbatê, jin û zayînê (Alataş 2015: 17). Mukkades Alataş ji Navenda Jinan a Kardelenê ku li bajarê Dîyarbekirê xebat dimeşîne, bi nirxandina xwe ya „ez bi nêzikatîyeke îslamîst meşandina tekoşîna jinan di cîh de nabînim, ji ber ku li wir zilam esas e [...]“ (Alataş 2015: 17),[41] piştgiriyê dide rexneyên derbarê Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar, ku mijara zilamtiyê nagire dest û nirxên baviksalariyê xurt dike. Li hemberî vê Emîne Altundaş ji beşa milê jinan a partîya AKP ya bajarê Trabzonê rexneyên tevgera jinan a Oldar-Muhafezekar ên li hemberî nêzikatîya Tevgera Femînîst a Tirkiyê – sekna ji jor de – ji nû ve dike mijar. Li gorî wê hin „tevger, rêxistinên jinan [...] dema ku dibêjin ‚em jinê bikin xwedî hêz‘, dibin sedema belevbûna yekitiya malbatê.“ (Altundaş 2015: 8)[42] Li gel vê Emîne Altundaş dîyar dike ku ew di xebatên xwe yên li Deryaya Reş û Trabzonê taybetî di xebatên heremî de „taybetên civakê“[43] esas digirin, û dibêje gere li gor pêdeviyên civakê aktîvîte werin li dar xistin (Altundaş 2015: 8). Bi awayekî din nêzikatiyên femînîst divê di hêla heremî de hin bi hêztir bi hev re bên girêdan. Ji Platforma Jinan a Paytextê Nesrin Semiz jî tevgera jinan wek komekê, bi awayekî monolotîk digire dest, tekîliya tevgera jinê bi ol re rexne dike û mîna li jêr

---

[40] „Pek çok diğer kadın derneği, özellikle dindar kadın derneği gibi, eğitim ve yardım, özellikle yardım konusu yok bizde. [...] Maddi yardım konusu, burs vs. şeklindeki bir şeyimiz yok, direk olarak kadın politikaları üzerinde çalışıyoruz sadece.“

[41] „İslami bakış açısıyla bir kadın mücadelesinin çok doğru olmadığını düşünüyorum çünkü orada erkeklik besleniyor [...].“

[42] „kadın organizasyonları, hareketleri [...] kadını biz güçlendireceğiz derken, bir anlamda aslında aile birliğinin bozulmasına da sebep olabiliyorlar.“

[43] „toplumun özeline“

bale dikişîne ser zahmetîyên bi hev ve girêdana tekoşîna jinê û parastina nirxên olî:

> […] Tevgera jin, bi taybetî hesasiyeta olê an jî ramana olî, wek oldarekê jiyînê, wek astenga herî mezin li pêşiya jinê dibîne. Neha dema weha be bi awayekî otomatîk tu dikevî nava pevçûnê. Lewre em dixwazin mîna ku bawer dikin bijîn. Vê […] bendê derbas kirin ji bo me gelek bi zehmet bû […] wek mînak di mijara sergirtinê de, jinên femînîst bi awayekî otomatik gotin ‚ev ji hêla mêran ve tê zor kirin, tu nikarî him femînîst bî û him jî serê xwe bigirî an jî di nav tevgera jin de cîhê xwe bigirî‘ […], bi salan şûn de bi xwe jî dîtin ku di rastiyê de ew jî li me tehdê kirine. (Semiz 2014: 24)[44]

Her çiqas di navbera Tevgera Jinan a Oldar-Muhafezekar û tevgerên jinan ên din de di mijarên malbat, ol, rolên jinan ên kevneşopî, zilam û desthilatdarî de nîqaş hebin jî mijarên hevbeş jî hene. Fîgen Aras Kaplan ku li Dîyarbekirê di Akademîya Jinan de aktif e, dibêje ku ew hewl didin ku li ser şopa krîza Rojhelata Navîn tê jîyan kirin de bi femînîstên îslamîst re bên cem hev û di mijarên îslamî de dixwazin bi femînîsten îslamîst re di nava tekîliyê de bin (Aras 2015: 12). Di hevdîtinan de derdikeve hole ku her çiqas tekîlîyên navbera jinên Oldar-Muhafezekar û tevgerên jinan ên din li Tirkiyê di salên 1990’an de li ser esasa mijara sergirtinê pêş ketibe jî, di çarçoveya nêzikatiya polîtîkayên hikumetê û di mijara muhafezekariyê de lawaz buye. Lê hîn jî di hin koalîsyonan de bi hev re têkîldar in û tên ba hev. Mînakên koalîsyonan di beşa III.3.B. „Mînakên Koalîsyonên Jinan ên li Qadên Lêkolînê“ (Binder 2017) de tê nirxandin.

1.4 Tevgera LGBTI

Zülfikar Çetîn di xebatê xwe ya „The Dynamics of the Queer Movement in Turkey before and during the Conservative AKP Government“ (Dînamîkên Tevgera Queer a li Tirkiyê, berî û piştî hikumeta AKP ya muhafezekar) (2016) de tîne ziman ku tevgera LGBTI di salên 1980’an de ji

[44] „[…] Kadın hareketi, özellikle dini hassasiyeti veya dini düşünceyi, yani dini dindar olarak yaşamayı, kadının önündeki en büyük engel olarak gören bir anlayışa sahip. Şimdi böyle olunca otomatik olarak bir çatışmaya giriyorsun. Çünkü biz mümkün olduğunca inandığımız gibi yaşamaya çalışıyoruz. Bu […] eşiği aşmak bizim için epey zor oldu; […] başörtüsünü mesela feminist kadınlar otomatik olarak erkekler tarafından dayatıldığını söyleyip, hem başını örtüp hem de feminist olabilme şansın yok veya kadın hareketinin içinde bulunabilme şansın yok şeklinde görürken, seneler sonra […] aslında kendilerinin de bir şekilde bize baskı yaptıklarının farkına vardılar.“

alîyên kesên trans û ji 1990’an vir de jî ji aliyê zilamên *gay* ve hatiye meşandin.[45] Diyar e ku di derdora salên 2000’an de kesên lezbîyen û trans di nava tevgerê de xwe bi awayekî xurt bi hêz dikin. Tevgera LGBTI, ku bi awayên komel û înîsîyatîfan xwe di nava civaka sîvîl de bi rêxistin dike, bi esas girtina mijara siyasetên zayenda civakî de tevgereke civakî ya gelekî giring e.

Yek ji encamên hevpêyvînên li bajarên cur bi cur bi aktîvîstên ku xwedî jiyanên cihereng in, hat çêkirin, ew bû ku; Tevgera LGBTI ji alîyê aktîvîstên di nava tevgerên femînîst ên cuda de cihê xwe digirin, an jî ji alîyê akademîsyen û aktîvîstên ku xwe wek aktîvîstên tevgera jinan dibinin, ji tevgera jinan jî ji ya femînîst jî cuda nayê dîtin. Herweha wek parçeyeke girîng a tevgera jinan tê dest girtin. Di hevpêyvîneke de – ya 2014’an li Enqerê – aktîvîstêkê ji „Jin bi israr li qada polîtîkayê ne“ – KIPS‘ê (Kadınlar Israrla Politik Sahada), ku giranî çalakiyên wan li Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn tên lidar xistin, dibêje „bi LGBTI re bi misogerî divê [bên] cem hev“ (Anonîm 2014: 33-34)[46] Di hevdîtîneke 2015’an li Denîzliyê, jineke aktîvîst ji Platforma Piştgiriya bi Jinan a Denîzlîyê têkîlîya hevpar a navbera kesên LGBTI û aktîvîstên jin, bi mînaka qada tekoşînê tîne ziman „Tevgera LGBTI û ya jinan bixwazin nexwazin nêzî hev in, ji ber ku herdû jî mexdurê sîstema heteroseksîst in.“ (Anonîm 2015: 76)[47] Heman aktîvîst her çiqas qada tekoşînê ya LGBTI ji hev cuda bigre dest jî, ji ber ku jinên lezbîyen û trans pirsgirêkên ji sedema jinbuyînê jîyan dikin, di navbera tevgera LGBTI û jinan de xaleke hevpar a girîng dibîne.

Ji Komeleya Pişgiriya bi Namzetên Jin a Enqerê Hatice Kapusuz-Kütküt dibêje: „[Tevgera LGBTI] li hemberî heteronormatîvîteyê tekoşîn dimeşîne, neheqîyên ku heteronormatîvîte pêş dixîne ji xwe yek ji pirsgirêkên me yên esasî ye. Li ser vî esasî xeta ku ew vekirine gelek bi nirx e.“ (Kapusuz-Kütküt 2014: 21)[48] Ev dîtin bi taybetî di çarçoveya pêşketina tevgera jin de girîngiya tekoşîna tevgera LGBTI ya li hemberî normên heteroseksîst tîne ziman. Aktîvîstên di nava tevgera jin de tekoşînê didin, di hevdîtinan de mijarên LGBTI ji derveyî tekoşîna li

[45] Di derbarê tevgera LGBTI ya li Tirkîye binêrin; Engin 2015; Köylü (Ed.) 2015.
[46] „LGBT ile kesinlikle bir arada [olunması] gerekiyor.“
[47] „LGBTİ hareketi ile kadın hareketinin ister istemez bir yakınlığı vardır, çünkü ikisi de heteroseksist düzenden mağdur.“
[48] „[LGBTİ hareketi] heteronormativiteye karşı mücadele ediyorlar ve bu bizim aslında yaşadığımız sorunların en temelinde yer alan şeylerden bir tanesi, heteronormativenin yarattığı eşitsizlikler. Onların açtığı çember gene çok kıymetli.“

hemberî heteroseksîzmê wek zayend, pirsgirêka zayendî, veguherîna zayendê bi rêze dikin. Wek mînak ji Zanîngeha Enqerê Serpîl Sancar tîne ziman ku ew tevgera LGBTI di nava tevgera jinan de dihesibîne. Li gorî dîtina wê LGBTI „li ser meyla zayendî, tercîhên zayendî“ (Sancar 2014: 32)[49] dixêbite û ev ji bo tevgera jinan qadeke xebatê ya gelek giring e.

Di çarçoveya hevpeyvînan de dikare bê gotin ku xebatên tevgera LGBTI yên derveyî tevgera jinan, di mijara heteroseksîzm û heteronormatîvîtê de wekî destketiyekê tê dîtin. Bi taybetî ji ji salên 2000'î vir de bi bilindkirina ala xwe ya *keskesor* di qada giştî de, bi çalakîyên xwe ji hêla hin rêxistinên jinan ve tê teqdîr kirin. Gülsen Ülkera ji Weqfa Piştgiriya bi Jinan a Enqerê tîne ziman ku „hemû rêxistinên LGBTI him gelek çalak in, him jî li her derê ne, li gorî min gelek karê baş dikin, guhertina zayendê [...] li ser pirsgirêka zayendê, li gorî min ev ji bo jinan jî gelek destketiyên girîng in“ (Ülker 2014: 24)[50] û bale dikşîne ser tecrubeya rexistinên LGBTI yên qadê û dînamîkbûna wan. Li gorî Ülker mijarên ku tevgera jinê digire dest, bi tevî qada tekoşînê ya LGBTI û mijarên wê yên ku li ser dixebite, firehtir dibe.

Hin kesên ku di nava tevgera jinan an jî ya femînîst de cîh digirin, balê dikşînin ser xala nîqaşên derbarê pirsa „kirdeyên tevgerên femînîst an jî yên jinê tenê jin in?“[51] Ji Zanîngeha Enqerê Alev Özkazanç li ser pirsgirêka ku bi taybetî di çalakîyan de û di 8'ê Adarê de derdikeve holê, weha vedibêjê:

> Ev çend salên dawî ne, di 8'ê Adaran de mînak li hemberî meşa jinên trans, kesen LGBTI problem derdikevin. Ji ber vê jî ev pirs disa tê kirin: „gelo trans jî di nava vî karî de ne? Kesên LGBTI jî parçeyekê ji tevgera jinê ne?“ û hwd. [...] Li gorî dîtina min Tevgera Femînîst wan jî digire nava xwe. Ango [wan jî] girêdayî tevgera LGBTI dibînim. (Özkazanç 2014: 24- 25).[52]

Li ser van nîqaşan aktîvîsteke ji Enqerê KIPS'ê jî balê dikişine ser nîqaşên xwe yên berê û

49 „cinsel yönelim, cinsel tercihlerle ilgili“
50 „LGBT örgütlerinin tümü zaten hem çok aktifler hem de alandalar, bence çok önemli şeyler yapıyorlar, cinsiyet dönüşümü [...] cinsiyet sorunsalına ilişkin, bence bu kadınlar için de çok önemli bir kazanım.“
51 „Kadın hareketlerinin ya da feminist hareketin öznesi sadece kadın mıdır?“
52 „Son birkaç yıldır 8 Martlarda, örneğin LGBT bireylerin, trans kadınların yürümelerine ilişkin problemler çıkıyor. Dolayısıyla bu soru tekrar soruluyor: ‚Acaba translar da hani bu işin içinde mi? LGBT bireyler de kadın hareketinin bir parçası mı?‘ gibi. [...] Benim görüşüme göre feminist hareket onları da içeriyor. Yani LGBT hareketiyle de bağlantılı görüyorum.“

dibêje: „Demekê me şerên weha gelek dikirin, gelo divê kî bibe kirdeya Femînîzmê? Jinên trans dikarin bibin kirde?“ (Anonîm 2014: 31- 32)[53] li gorî wê ev mijar êdî di berê de maye.

Nîqaşên di derbarê ‚kesen trans jî dikarin bibin kirdeyên tevgerên jinan an na‘ ji alîye tevgera LGBTI ve jî gelek tê nirxandin. Di hevdîtinan de aktîvîstên LGBTI xebatên ku bi tevgera jinan re hevpar hatine organize kirin, ji bo bersîva vê pirse wek mînak nişan didin. Ev rewş wekî mînakekê balkêş derbarê koalîsyonan û karên hevpar de derdikeve pêş. Di heman demî de ev rewş dide xuya kirin ku hin tevgerên jinan li ser kirdeyê li hev nekirine. Pirsa „kirdeya tevgerên jinan ki ye?“[54] di navbera hin tevgerên jinan de û LGBTI de ji hev dûrketinê mezin dike. Bi taybetî kûrbûna vê cudabûnê û mijara jin û trans jî di nivîsên raporê yên III.3.A. „Mijarên ku li Tirkîye tevgerên jinan ji hev cihê dikin û dikin yek“ (Polatdemir 2017)û III.1.A. „Têgeheke Navendî û Têgihiştinên wê yên li Qadê: Jin-Bûn“ (Binder 2017) de tên dest girtin.

Yek ji daneyeke girîng a di encama xebatên qadan de derket holê jî mînakên çalakîyên hevpar ku ji alîye tevgera LGBTI û tevgera jinan ve hevpar hatine organize kirin in. Li Denizliyê Meclîsa Jinan a Şaradariya Bajarê mezin belgefîlma LISTAG’ê ya bi navê „zarokê min“ (*Benim Çocuğum)*, ku çîroka 5 malabatên xwedî zarokên LGBTI digire dest, nişan dide. Bahar Bostan a ji Komîyona Mafe Jinan a Baroya Trabzonê mînak dide ku wan bi alîkarîya KAOS GL û Komeleya Jîyana Helesor *Pembe Hayat* li Trabzonê Atolye lidar xistine, di mijara LGBTI û cudakirinê de bi Parezvanan re perwerdeyên têgihiştinê çêkirine. Ji Zanîngeha Enqerê Alev Özkazanç qala dersên ku ji hêla KAOS GL û Navenda Lêkolîn û Sepana Pirsgereka Jinê KASAUM’ê bi hevkar tên dayîn, wek mînak nişan dide. Firat Varatyana ji Masiya Binevşîn *Mor Balık* behsa civînên xwe yên tevlî KAOS GL li Zanîngeha Teknîk a Trabzonê hatine li dar xistin, dike. Ew li Fakulteya Ragîhandinê ya Zanîngeha Teknîk a Trabzonê li ser medya û LGBTI de pêşkêşî çêkirine. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku tevgera LGBTI bi gelemperî li bajarên ku lêkolîn lê hatine çêkirin bi Zanîngeh û tevger/rêxistinên femînîst re xebateke hevbeş dimeşîne. Xebatên hevbeş herî zêde li bajarê Enqerê derdikevin pêş. Sedema vê jî ew e ku navenda KAOS GL li Enqerê ye. Gorî ku di mînakan de jî derdikeve holê, KAOS GL mîna aktorekî LGBTI piştgiriya xebatên LGBTI dike, herweha hevkarîya LGBTI li bajarên din bi tevgerên civakî re dike, heta karên LGBTI digire ser xwe. Dîsa ligel mijarên nîqaşê yên berê

[53] „Zamanında çok böyle kavga ediyorduk biz. Feminizmin öznesi kim olmalı? Trans kadınlar özne olabilir mi?“
[54] „Kadın hareketlerinin öznesi kim?“

hatibûn ziman, Koalîsyona Jinan û Lobîya Jinan a Ewropayê Koordînasyona Tirkiyê ji bo mînaka koalîsyonan tevgera LGBTI û hevkariya wê ya bi tevgerên jinan wek mînak nîşan dan. Bahar Bostan (Bostan 2015: 16) tîne ziman ku ji hev veqetandina tevgera jinan ji tevgera queerê û ji tevgerên mafên mirovan ne mumkun e û koalîsyona tevgera LGBTI bi tevgerên jinan re di bin sîwana mafên mirovan de datîne. Alev Özkazanç jî bale dikşîne ser xebatên xwe yên akademîk, bi bîr dixine ku ev xebat alîkarî dide sererastkirina tekîliyên di navbera tevgera jinê, LGBTI û femînîst. Tevgera LGBTI û mijarên ku ew pêşkêşî nîqaşê dikin, kêtine rojeva xebatên akademîk. Her çiqas tevgera LGBTI bi mijarên – zayenda civakî, meyla cinsî, zayendî – ku di nav civakê de wek tabû ne, alîkariya tevgerên jinan ên din bike û ev yek ji bo pêşketina polîtîkayên koalîsyonê gelek girîng be jî, dîsa jî di mijara ‚LGBTI parçeyekê tevgera jinan e, an na‘ de hîn jî tê nîqaş kirin.

Jülide Keleş Yarışan ji Kuluba Soroptîmîst a Denîzlîyê dide dîyar kirin ku ji ber tevgera LGBTI mijara zayendê zêde dixe nav rojevê û mijara niqaşê ya karkerîya seksê di navbera tevgera LGBTI û tevgera jinên din de dibe sedema nîqaşê:

> Karkeriya seksê û [mesafeya] tevgera jin [di vî mijarî de] an jî ya me, […] tevgera jin ji […] [mijara] seksê hinekî dûr e, hin girtî maye û […] dibe ku vî mijarî bi dengê bilind anîna ziman a tevgera LGBTI […] carcaran hinekî ji bo li cem hev sekinandinê dibe asteng. Lê dîsa […] jî li gorî min herdû bi hev re dimeşin. (Keleş Yarışan 2015: 12)[55]

Nîqaşen derbarê karkeriya seksê ji bo tevgera LGBTI jî mijareke gelek girîng e. Bi taybetî jî ji alîyê aktîvîstên LGBTI yên bajarên Dîyarbekir û Trabzonê ve tê ziman ku tevgera jinan di mijara karkerîya sekse de dûr disekine. Di hemen demî de Sema Kendirici Uğurman a ji Yekîtîya Jinên Tirk jî tîne ziman ku tevgera jinan a oldar/muhafezekar ji ber sedemên olî naxwazin di çalakîyan de bi tevgera LGBTI re cem hev bisekinin. Lê belê mîna Jülide Keleş Yarışan dide xuya kirin, him mijarên di çarçoveya exlaq te tên nîqaş kirin, him jî cudabûna ku di mijarên olî de derdikevin pêş, di xebatên hevpar ên navbera tevgera LGBTI û tevgerên jinan

[55] „Seks işçiliği ile kadın hareketinin [bu konuya] durduğu yer arasındaki [mesafe] ya da bizim, […] kadın hareketinin hep […] seksten biraz daha uzak, daha kapalı kalmış olması ve […] LGBT hareketinin bunu bangır bangır söylüyor olması belki […] hemen bir arada durmaya biraz engel olabiliyor bazen. Ama […] ikisi birlikte yürüyor bence.“

de nabin asteng.

Aktîvîstên LGBTI yên li bajarê Dîyarbekir, Enqerê û li heremên Egeyê tevlî hevpêyvînan bibûn, di serî de bale dikşînin ser tekîlîya xurt a di navbera Tevgera LGBTI û tevgera jinan. Dîlan Çiçek a ji Înîsîyatîfa LGBTI Keskesorê ya Dîyarbekirê bi nirxandina xwe ya „jinbûn tiştekî ku bi her tiştî re tekîldar e, tiştekî ku bi mîlîtarîzmê re têkîldar e, bi zilamtiyê re, bi desthilatdariyê re, disa bi tekoşîna LGBTI re, tişteki ku bi van re raste rast têkîldar e.“ (Çiçek 2015: 10)[56] li ser esasa jinbûnê tekîliya navbera tevgera LGBTI û ya tevgera jinê datîne. Ji Komeleya LGBTI Hebûn a ku li Dîyarbekirê xebatên xwe dimeşîne, Arîf dibêje:

> Ger tekoşîna hebûna jinan fireh bibe, dê ji me re cîh vebibe, em jî bi vî awayî […] dikarin bên cîhekî baş, ango ger îro tevgera jinê di rewşeke xerab de be, dê tevgera LGBTI nikaribe were cîhekî baştir. (Arîf û yên din 2015: 152-159)[57]

Vê dîtina Arîf mirov dikare bi vî awayî şîrove bike: Tevgera LGBTI ne di nava tevgera jinan de ye, lê belê bi giranî pê ve giredayî ye, di navbera herdû tevgeran de rajêrîyekê dualî heye. Herdû aktîvîst jî tevgera LGBTI û tekoşîna li hemberî heteroseksîzmê derveyî tekoşîna ku tevgerên jinan didin nabînin û bale dikişînin ser pêwîstiya tekîliya navbera herdû tevgeran. Hevdîtinên li Diyarbekirê bi aktîvîstên LGBTI re hatin kirin, dîyar dikin ku komên di destpêkê rexistinên LGBTI naskirine û pêjirandine rêxistinên jinan bûne. Lê bele hîn jî di hin qadan de nakokî di navbera Tevgera LGBTI û jinan de heye, li gorî aktîvîstên LGBTI ew hîn jî bi tevahî nayên pêjirandin. Li Enqerê ji KAOS GL Seçîn Tuncel balê dikişîne ser piralîbûnên nav Tevgera LGBTI û rexneyên xwe li dijî nêzikatîyên ku vê piralîbûnê paşçav dikin, dike:

> Ji min re wisa tê ku li Tirkiyê herdem ji tevgereke LGBTI û […] ji tişteke ku ji stereotîpê pêk hatiye tê behs kirin, lê bi rastî […] meyla zayendî û nasnameya zayendî gelek gelek […]cuda ye. Di heman demî de […] ez jineke lezbiyen im, li bajarê mezin dijîm, ji ber vê sedemê pirsgirêkên lezbiyeneke

[56] „Kadın olmak her şeyle ilişkili bir şey: Militarizmle ilişkili bir şeydir; erkeklikle, erillikle, yine LGBTİ mücadelesiyle, bunlarla direkt ilişkili olan şeylerdir.“

[57] „Kadınların varoluş mücadelesi genişlerse bize alanlar açılacak, biz de bu şekilde […] iyi bir yerlere gelebiliriz, yoksa bugün kadın hareketi kötü bir noktadaysa, LGBT hareketi iyi bir noktaya gelmeyecektir.“

> ku li gundewariyê de dijî, dikarin ji yên min gelek gelek cuda bin.(Tuncel 2014: 16)[58]

Di heman demî de mirov dikare vê daxuyaniya Tuncel bi vî awayî şîrove bike; aktîvîstên Tevgera LGBTI bi nîqaşa bajar-gundewar didin dîyar kirin ku ew bi derdora xwe re eleqedar in. Hatice Kapusuz Kütküt balê dikişîne û dibêje, li herêma Enqerê Tevgera LGBTI parçeyeke girîng a sîyeseta koalîsyonê ye.

> [Em] li herêma Enqerê mijara LGBT herdem dikin parçeyekê xebata xwe, ne tenê sîyaseta jinê, em dixwazin hemû qadên ku ji aliyê siyaseta desthilatdar a zilam ve hatiye der kirin, bibînin. Neha [em bi] rexistinên LGBT re, li ser vî esasî di nav hevkarîyê de ne. (Tuncel 2014: 3)[59]

Di heman demî de Fırat Varatyanê ji Masîya Binevşîn *Mor Balık* dide dîyar kirin ku LGBTI di encama aktîvîteyên wan ên li herema Trabzonê tê dîtin û hestên xwe yên di derbarê bilindkirina ala keskesorê – ligel hemî zehmetiyan – di çalakîyên 1 Gulanê de weha parve dike:

> Li zanîngehê mamosteyên piştgirt dîtin bo min xeyal bû, pêk hat. Di 1’ê Gulanê de li vir meşîn ji bo min xeyal bû, pêk hat. Ala keskesorê bilind kirin û meşîn, […] ez dikarim bibejim roja min a herî xweş a li Trabzonê bû. Ji ber ku wê rojê yekane roja min a ku min hemû nasnameyên xwe girtî bû ser xwe, bû. (Varatyan 2015: 19) [60]

Encamên hevpêyvînên bi pisporan re dest nişan dikin ku ligel mijarên nîqaşê, di navbera Tevgera LGBTI û tevgera jinan de tekîliyên xurt û hevbeşîyek heye. Ev têkilî di gelek hevpêyvînên pisporan de wekî rajerîyekî dualî tê binav kirin. Dema tevgerên jinan Tevgera

[58] „Türkiye’de hep bir LGBTİ hareketlerinden ve […] bir stereotipten oluşan bir şeyden bahsediliyormuş gibi geliyor, ama aslında […] cinsel yönelim ve cinsiyet kimliği çok çok farklı ve […] değişik. Aynı zamanda ben […] büyük şehirde yaşayan bir eşcinsel kadınım, dolayısıyla taşrada yaşayan bir eşcinsel kadının sorunları da benden çok çok daha farklılaşabiliyor.“

[59] „Ankara özelinde LGBT konusunu hep çalışmalarımızın parçası haline getiriyoruz, sadece bir kadın politikası değil aslında erkek egemen siyasetin dışladığı her alanı görmeye çalışıyoruz bu bakımdan. İşte LGBT örgütleri bu anlamda dayanıştığımız örgütler.“

[60] „Üniversiteden destekçi hocalar kazanmak benim için hayaldi, oldu. Bir 1 Mayıs’ta burada yürümek benim için hayaldi, oldu. Ki gökkuşağı bayrağını açıp da yürümek, […] Trabzon’daki en güzel günümdü diyebilirim. Çünkü tüm kimliklerimi üzerime alarak yürüyebildiğim tek gündü.“

LGBTI wek hevparê koalîsyonê bibînin, herdû alî jî ji hev hêz digirin û dînamîkekê bi dest dixin. Dema jinên trans jî bi nasnamêyên xwe yên aktîvîstên LGBTI ji alîyê tevgerên jinan ve werin dîtin û naskirin, dibînin ku nasnameya wan a jin di nav civakê de tê pêjirandin.

Çavkanî

- Akal, Emel (2011): *Kızıl Feministler- Bir Sözlü Tarih Çalışması.* Cağaloğlu, İstanbul: İletişim (Araştırma-inceleme dizisi, 267).
- Arat, Yeşim (1994): „Toward a democratic society“. Di nav: *Women's Studies International Forum* 17 (2-3), p. 241–248. DOI: 10.1016/0277-5395(94)90030-2.
- Arat, Yeşim (1997): Der republikanische Feminismus in der Türkei aus feministischer Sicht. Di nav: Claudia Schöning-Kalender, Aylâ Neusel, Mechthild M. Jansen (Ed.): Feminismus, Islam, Nation. Frauenbewegungen im Maghreb, in Zentralasien und in der Türkei. Frankfurt am Main, New York: Campus Verl., p. 185–196.
- Bora, Aksu; Asena Günal, (2002): *90'larda Türkiye'de feminizm*. Cağaloğlu İstanbul: İletişim (Bugünün kitapları, 77).
- Çağatay, Selin (2008): Kemalizm ya da Kadınlık. Çağdaş Kadının Başörtüsüyle İmtihanı. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Istanbul Bilgi Universitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, nihêrtina dawî 5/5/2017.
- Çaha, Ömer (2013): *Women and civil society in Turkey. Women's movements in a Muslim society*. Farnham: Ashgate Publishing.
- Çakır, Devrim (Ed.) (2005): *Kadın hareketinde mücadele deneyimleri. Özgürlüğü ararken.* İstanbul: Amargi.
- Çetin, Zülfukar (2016): *The Dynamics of the Queer Movement in Turkey Before and During the Conservative AKP Government*. Berlin: SWB (1). Navnîşana online: https://www.swp-berlin.org/fileadmin/contents/products/arbeitspapiere/WP_RG_Europe_2016_01.pdf, nihêrtina dawî 5/5/2017.
- Çolak, Yılmaz (2008): „The Headscarf Issue, Women and the Public Sphere in Turkey“. Di nav: *Global South* 4 (5), p. 10–16.
- Diner, Cagla; Toktaş, Şule (2010): „Waves of feminism in Turkey. Kemalist, Islamist and Kurdish women's movements in an era of globalization“. Di nav: *Journal of Balkan and Near Eastern Studies* 12 (1), p. 41–57. DOI: 10.1080/19448950903507388.
- Engin, Ceylan (2015): „LGBT in Turkey. Policies and Experiences“. Di nav: *Social Sciences* 4 (3), p. 838–858. DOI: 10.3390/socsci4030838.
- Göle, Nilüfer (1996): *The Forbidden Modern. Civilization and Veiling*. Ann Arbor: University of Michigan Press (Critical perspectives on women and gender).
- Köylü, Murat (Ed.) (2015): *Türkiye'de LGBTİ Haklarının Durumu ve Öneriler*. KAOS GL. Enqerê: Kaos

Gey ve Lezbiyen Kültürel Araştırmalar ve Dayanışma Derneği (KAOS GL). Navnîşana online: http://www.kaosgldernegi.org/resim/yayin/dl/de_lgbti_haklarinin_durumu_ve_oneriler.pdf, nihêrtina dawî 5/5/2017.

- Özçetin, Hilal (2009): „ ‚Breaking the Silence‘. The Religious Muslim Women's Movement in Turkey“. Di nav: *Journal of International Women's Studies* 11 (1), p. 106–119.
- Özdemir, Elvan (2010): „Kemalist Tradition and Kemalist Women’s Movement in Turkey after 1980“. Di nav: *Turkish Journal of Politics* 1 (1), p. 99–113.
- Persentili, Nurşen (2013): *TÜRK KADINLAR BİRLİĞİ 1923 - 2013 Doksan Yıllık Örgütlü Mücadele.* İstanbul: Karınca.
- Samandi, Zeyneb (1997): „Die islamistische Frauenbewegung. Zur Problematik des Identitätsansatzes“, Di nav: Claudia Schöning-Kalender, Aylâ Neusel, Mechthild M. Jansen (Ed.): *Feminismus, Islam, Nation. Frauenbewegungen im Maghreb, in Zentralasien und in der Türkei*. Frankfurt am Main, New York: Campus, p. 305–330.
- Şimşek, Sefa (2004): „New Social Movements in Turkey Since 1980“. Di nav: *Turkish Studies* 5 (2), p. 111–139. DOI: 10.1080/1468384042000228611.
- Somersan, Bihter (2011): *Feminismus in der Türkei*. Die Geschichte und Analyse eines Widerstands gEgeyên hEgeyêmoniale Männlichkeit. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Wedel, Heidi (2000): „Frauen in der Türkei. Modernisierungs- und Identitätspolitiken in der Türkei“,Di nav: Der Bürger im Staat, p. 37–42.